

Pispor li gorî cerebeyan: Şîretên Abdullah yê ji bo ajotinê

Abdullah sala 2017an bi zanîna çend peyvên înglîzî wekî penaberekî ji Sûriyeyê hate UKê û ji aliyê Koma Sponsorîya Civaka CHARISê li Başûrê Rojava bi dilgermî hat pêşwazîkirin. Piştî 10 mehan wî testa teorî û ya pratîkê ya ajotinê derbas kir, ku vê serxwebûn û azadiyeke jiyânî dayê.

Gava Abdullah gihîşt UKê, destûra wî ya ajotinê ya Sûriyeyê ya derbasdar hebû ku dikaribû bi wê destûrê bêyî derbaskirina testan salekê li UKê siyare biajo. Abdullah li navçeyeke biçûk ya UKê dijî û zû tê gihîşt ku ji ber kêmbûna amrazên veguhestina girseyî pêdiviya wî bi siyareyekê heye; loma wî dizanî divê ew ji bo fêrbûna înglîzî konsantre bibe û demildest ji bo testa teoriyê bixebite. Piştî du mehên li UKê wî dest pê kir û sê mehan, hefteyê herî kêr sê rojan û rojê sê saetan xebitî. Abdullah dît ku bikaranîna bernameyeke wergerandinê ya bi navê ABEL Drive for Life ji bo testa teoriyê alîkariya wî dike ku pirsan wergerîne erebî. Vê alîkariya wî kir gava ew bixebite pirsan bi înglîzî bixwîne û bi erebî guhdarî bike.

Abdullah dibêje, "Min testa teoriyê di cara duyemîn de derbas kir. Ji min re gelekî baş bû ku min di testê de berguhk bi kar anî û him pirs xwendin him bihîstin. Bi vî awayî gava min peyvek ji nivîsandina wê fêr nekira min bi bihîstina wê fêr fikir. Heke mirov bixwaze pirsan guhdarî jî bike divê mirov vê di pêşiyê de bibêje. Ez vê ji dil pêşniyarî hemû kesan dikim ku hê jî fêrî înglîzî dibin. Ya rast - mirov dikare pirsan tenê bi înglîzî bibihîze, ne bi zimanê xwe."

Abdullah ji bilî fêrbûna ji bo testa teoriyê 12 saetan dersên ajotinê jî dît ku diviya ji bo testa pratîk amade be ku di vê testê de divê mirov ji dîrektîfên peywirdarê testê fêr bike. Dersên ajotinê ne erzan bûn, loma CHARISê ji bo hîbeyeke £500 ya ji bo hemû dersan û testan serî li Goldman Sachsê da. Hin şîretên Abdullah yê ji bo wan penaberan heye ku dixwazin li UKê siyareyan biajon: "Ji bo penaberên din, ji bîr nekin ku divê hûn bi awayekî cidî nêzîkî vê bibin û gelekî bixebitin. Heke hûn kedê bidin hûn ê bi ser bikevin. Heke hûn cara pêşî derbas nekin xemgîn nebin, bi berdewamî bixebitin."